**ALÎKARIYA PERAN: AGAHÎ JI BO KESÊN KU JI WARGEHAN TÊN GUHESTIN CIYÊN MÊVANXANÊN QOMÎSERIYA BILIND A NETEWÊN YEKGIRTÎ JI BO PENABERAN**

**ADAR 2017**

**Hun di demeke nêzîk da ji wargeha fermî a ku di bîn reveberiya hukumetê da bûn û ciyê ku vê gavê hun hatine guhestin saziya rêvebir a wê mêvanxanê xanî an jî otêl , bi Qomîseriya Bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan re hevkariyê dike?**

**Eger ev tişt diqewime, wê demê gerek hun van tiştana zanibin :**

- Hunê alîkariya peran li ciyê xwe ê nu jî bigrin.
- Ciyê ku hun hatine guhestin li wir wê qerta peran a nu bidine we, dema ku hun saziya ku bi Qomîseriya Bilind re hevkariyê dije ji bo ciyê ku hun jê hatine û ciyê ku hun vê gavê hatine guhestin agahdar bikin. Ev agahı ji bo ku alîkariya peran bidine we û malbata we pêwist e.
- Ew qerta ku ji ciyê ku hun jê hatine wê kar bike lê êdî pere li wê qertê nayê dagirtin. Ev tê wê wateyê ku , qert heta ku pere tê da hebin wê kar bike.
- Hêjmara perê ku ciyê ku hun lê hatine guhestin hunê bistînin, li gorî ciyê mêvanxanê û li vî ciyî xwarin tê belavkirin an na wê bê guhertin.
- Mîna ke, eger hun hatine guhestinî otêlekê û li vir xwarinê didin, eger aşxane hebe jî wê dîsa wek ciyê ku xwarin dihate belavkirin hunê peran biatînin.
- Mîna ke, eger hun hatine guhestinî xanîkî û di mal da xwarinê bi xwe çêdikin , wê demê hunê ji ciyê ku hun hatine zêdetir peran bistînin ji ber ku li vir xwarin nayê belavkirin û hun xwarinê bi xwe çêdikin.

**Çi pêwiste ez bikim?**

- Ji kerema xwe re dema ku hun diçin, saziya ku alîkariya peran dide we , ji bo çûyina xwe û ciyê ku hunê herinê agahdar bikin.
- Dema ku hun gihîştin ciyê xwe ê nu, ji kerema xwe re saziya ku hevkariyê bi Qomîseriya Bilind re dike û alîkariya peran li vir dike agahdar bikin û eger mimkûne navê saziya ku li ciyê we ê berê ku alîkariyan peran dida we navê wê bêjin.

**Li ciyê berê ku ez rûniştîbûm ezê hîn peran ji wir bistînim?**

- Na, gava ku hun ji ciyê xwe çûn dereke din hunê tenê li ciyê xwe ê nu alîkariya peran bistînin.
- Ji bo ku pêşî li dubare tomarkirinê were girtin û ji bo ku hemî sazî karê xwe bikin û heta ji dwstê wan tê alîkariya zêdetirê mirovan bikin, wê alîkariya we a ciyê berê were qutkirin ji ber ku ciyê ku hun lê hatine guhestin otêl an jî xanî , vê gavê li vir saziya ku hevkariyê bi Qomîseriya Bilind re dike heye.
- Li hemî ciyên mêvanxana cî kêm in , ku hun ji wargehê çûne û hîn hun cî li wargehan konteyner an jî li ode ya dagir dikin, ev tê wê wateyê ku hindik cî dimînin ji bo kesên ku cî ji wan re lazim e. Ji bo va bûyeran nebin pêşî li wan tên girtin û çare ji qan re tê dîtin.

- Ji bo ku butçeya hemî saziyan ji bo bernameyên wan bisînorin, sîstema sereraatkirinê wê dubare tomarkirina we wê tesbît bike û evê ev búyer bikeve dosya ya we. Ev tişt mimkûne di pêşerojê da tesîrê li alîkariya hun digrin bike. Eger hun bi şaşî an jî bi zanetî alîkariyê dubare bigrin , ev tişt wê li kesên ku mafê wanê ji bernameya alîkarî girtinê bike.

**Eger ez werim guhestin, wê çi wext pere bikevin qerta min ?**

- Hunê her heyv alîkariya peran bigrin, eger hun di serê heyvê an jî di nava heyvê de werin guhestin , hunê li ciyê xwe ê nuh heyva din alîkariya peran bigrin. Mîna ke : eger we di 2'ê Sibatê da li ciyê ku hun rûniştîbûn we pere girtibûn û di 15' ê Sibatê da hune hatin veguhestinî wargehike a Qomîseriya Bilind , hunê dîsa li wargehên Qomîseriya Bilind ji bo heyva Adarê hunê peran bigrin.
- Ji ber ku mimkûne ku gava hun gihîştin ciyê rûniştandina xwe a nu , hima qertê we û pere nedine we, gerek hun li perê xwe miqatebin ji bo ku hun hemî perê xwe xercnekin. Eger hun perê xwe giştîkan xerc bikin û hun bê pere bimînin hun zanibin ku heta heyva din wê perê din nedine we.
- Eger hun di roja ku ji ciyê berê hatin guhestin û we pere ji wir negirtin an jî ciyê ku hun vê gavê hatine guhestin lazime hun xwarinê bi xwe çêbikin, wê çaxê ji kerema xwe re personelê saziya ku hevkariyê bi Qomîseriya Bilind re dike ji bo va pirsgirêkana wan agahdar bikin.

**Ev alîkariya peran ji bo kîjan mesrefan e?**

Ev alîkariya peran ku tên dayîn , ji bo hewceyiyên we ê esil in, wek xwarin û vexwarin, veguhestin, têkilî, cil û berg, tiştên paqijiyê, îlac û derman, ji bo rewşên acîl û ji bo mesrefên dibistanê ne.

**Ji bo veguhestinê ez kanim alîkariya aborî bigrim?**

Eger hun li wargehên mêvanxanên ku Qomîseriya Bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan dimînin û hun mecbûrin herin Ofîsa Xizmetên Îltica yê an jî Balyozxaneyan an ji nexweşxaneyan û ev cî li ciyê ku hun rûniştine dûr in , wê çaxê Qomîseriya Bilind bi rêya rêxistina ku li ciyê we rêvebir e wê alîkariya we ji bo guhestinê bike. Ji bo zêdetirên agahiyan hewceye hun bi şewirmendê civakî re bikevin têkiliyê.

Eger ciyê ku hun dixwazin biçin ji mala we nedûr e, wê wextê hun li wargehên fermî ên dewletê jî bimînin an jî hun li wargeha ku reveberiya wan ji aliyê saziyên mirovahî ên ku hevkariyê bi Qomîseriya Bilind re dikin jî bimînin wê Qomîseriya Bilind ji bo çûyina we a Ofîsa Xizmetên Îlticayê bilêtan nede we. Veguhestinên di nava bajêr da bi perê ku hun her heyv distînin bi wan peran heqê va guhestinan tên dayîn.

Eger ji Ofîsa Xizmetên Îlticayê agahdarî ji bo di derbarê bernameya Vecihîkirinê û biryara we a ji bo Vecihîkirina welatikî din hatibe, wê ji bo çûyina we a wî welatî wê Saziya Navnetwî a ji bo Penaberan alîkariya we bike .

Eger ji Ofîsa Xizmetên Îlticayê agahdarî ji bo Hevgîhandina Malbatê ji bo ku endamekî malbata we li welatekî din e ( li gorî qanûna Dublînê) wê ji bo çûyina we a wî welatî wê Qomîseriya Bilind alîkariya we bike.

**Ji bo tenduristiyê ez kanim alîkariya aborî bigrim?**

Alîkariya peran ku tê dayîn qîmî hindik tedawiyên tibbî , wek dermanên buha û qontrola doktor a hercarî ji bo nexweşiyên bi salan , ê wek nexweşiyên giran an jî seqwtî ,emelî kirin û zarok anîn.

Eger hin nexweşiyên we ên aboriya taybetî jê re lazim e, mimkûne perêyê din ji we re wwre dayîn. Di rewşên wisa da ji kerema xwe re an personelên Qomîseriya Bilind an jî saziya ku saziya ku li ciyê ku hun rûniştinen ji vê hewceyiya xwe agahdar bikin da ku ew kanin ji were alîkariyê bikin an na.

**Agahiyên din :**

Qomîseriya Bilind a Netewên Yekgirtî ji bo Penaberan , Wezareta karê Penabertiyê û sazîyên hevkar ê mirovahî bi hev re kar dikin ji bo xizmetên ji were bikin û ji bo rewşa we a li wargeh û ciyên mêvanxana xweştir bibe. Bernameyên alîkariya peran ji bo kesên ku lu wargeh û ciyên mêvanxana dimînin e û hêjmara alîkariya peran li gorî mezinbûna malbatê û li gorî ciyê ku hun rûniştînin xwarin û vexwarin tê dayîn an na tê hesabkirin. Hêjmara perê ku tê dayîn gerek ji perê ku dewleta Yûnan ji bo beenamwya benda ewlahiyê ku dide hemwwlatiyê xwe derbastir neke. Hêjmara peran li gorî ciyan nayê guhertin , rêxistinên cûde li heremên cûde alîkariya peran a qargeh û malan dikin.

Ji bo ku alîkariya peran rast û bi edalet were belavkirin hewcwyiya hevkariya we heye.